

A Guide to School in England and Wales

Education Levels in English and Welsh Schools

Early Years/Foundation Stage (EYFS):

Pre-school and Reception

Pre-school:

- Children start Reception after the age of 3.
- After turning 3, children are entitled to 15 free hours of childcare per week, some parents choose to pay for more.
- Some pre-schools also take 2-year-olds.

Reception:

- For children aged 4-5.
- Children start Reception the September after their 4th birthday.

Primary School:

Infants:

Key stage 1 (KS1): refers to Years 1 and 2 for ages between 5-7 years

Juniors:

Key stage 2 (KS2): Refers to Years 3 to 6 for ages between 7-11years

Secondary School:

- Aged between 11-16

Key stage 3 (KS3): refers to Years 7-9 for ages between 11-14

Key stage 4 (KS4): refers to Years 10-11 for ages between 11-16

GCSE: exam at end of Years 11

School Terms:

Autumn term: from September to December.

- Half Term- usually around end of October, (one week) off.
- Christmas holiday (two weeks).

Spring term: from January to Easter Half Term.

- (One week) holiday in February.
- Easter holidays (two weeks) in March or April.

Summer Term: from April to July.

- Half term holiday (one week) it will be in the last week of May or in the first week of June.
- Summer holiday (six weeks) in July and August.

The school day

- Classes begin at 9 o'clock in the morning, but students need to arrive at the school before that time to prepare themselves for study.
- There is a break time in the afternoon (lunch time) during this break the children have lunch at the school.
- School hours end at 3pm in the evening for (pre-school), and 3:15 for the rest of the children.

Homework:

EYFS – Early Years Foundation Stage (pre-school and Reception):

- Parents are usually expected to read regularly with their children (reading to them, then listening to them when they learn to read).
- The teacher may set a weekly fun homework linked to the topic they are studying- very informal. Reading is most important.
- Homework expectations can vary from school to school.

Key stage 1 (KS1): Years 1 and 2 :

- Homework is normally very informal- reading is the most important.
- Children might also have a weekly challenge or worksheet (Maths or English).

- Also spelling homework normally starting in KS1. Children may have 5-10 spelling words per week.
- Some schools also subscribe to online learning platforms eg. Nessy, Purple Mash, Time Table Rockstars.

Key stage 2 (KS2): Years 3-6 :

- Children may have English\Maths worksheet each week.
- Spelling for weekly tests.
- There may be a work project in each term linked to a specific topic chosen by the teacher.
- Plus online learning if desired.

Clubs:

- Most schools offer extracurricular activities either at lunch time or after school. These activities are currently reduced due to Covid-19 restitution.
- For example, after school clubs could include football, tennis, basketball, netball etc. Or non-sports activities such as choir, art club or dance club etc.
- Some schools also offer after school clubs and breakfast clubs, which is free for children whose parents who are working or need their children to be looked after outside of school hours.

Parents/Teacher Meetings:

- Normally, there would be a chance each term to meet in person with your child's teacher (parents evening) for a more formal chat about how your child is getting on.
- Depending on Covid-19 restrictions, these meetings may be moved online.
- If you have any concerns about your child and would like to speak to their teacher, you may be able to speak to them in the playground, or phone or email them to arrange an appointment.

Non-Uniform School Days:

- Often, once a term, a school may have a non-uniform day to raise money for charity. Children can wear their own clothes.
- Usually also offering £1 donation.

- Parents will be informed about non-uniform days by a letter or an email.

Physical Education (PE):

- Meaning teaching physical exercise and games especially in school.
- Children have separate clothes to wear for to their PE lesson.

School lunch:

- Children can choose to have a hot cooked meal at school or bring in their own packed lunch.
- School dinners are free for all children up until the end of Year 2, but certain children can continue to receive free school meals as part of a government scheme.
- Children should bring their water bottles with them to school.

Rêbernameyek ji bo Dibistanê li Înglistan û Walesê

Astên Perwerdehiyê li Dibistabên Înglistan û Walesê

Salên Pêşî/Asta Bingehîn (EYFS)

Kreş û Pêşdibistan

Kreş

- Zarok piştî 3 saliya xwe dest bi Kreşê dikin
- Piştî ku zarok dikevin 3 saliya xwe mafê wan yê venêrîna belaş ya 15 saetan çêdibe; hin welî dixwazin heqê saetên zêdetir bidin.
- Hin kreş 2 saliyên jî qebûl dikin.

Pêşdibistan:

- Ji bo zarokên 4-5 salî:
- Zarok îlona piştî 4 saliya xwe dest bi pêşdibistanê dikin.

Dibistana Seretayî:

Bebik:

Asta kilîl 1 (KS1): temenên navbera 5-7an û Salên 1 û 2yan pênase dike

Ciwan:

Asta kilîl 2 (KS2): temenên navbera 7-11an û Salên 3 û 6an pênase dike

Dibistana Navîn

- Temenên navbera 11-16an

Asta kilîl 3 (KS3): temenên navbera 11-14an û Salên 7-9an pênase dike

Asta kilîl 4 (KS4): temenên navbera 11-16an û Salên 10-11an pênase dike

GCSE: azmûna dawiya Sala 11an

Serdemên Dibistanê:

Serdema payîzê: ji îlonê heta kanûnê.

- Nîvê Serdemê - bi piranî li dora dawiya cotmehê, (hefteyek) betlane.
- Betlaneya Noelê (du hefte).

Serdema biharê: ji çileyê heta serdema nîvî ya Paskalyayê

- (Hefteyek) betlane sibatê.
- Betlaneyên Paskalyayê (du hefte) adarê û nîsanê.

Serdema havînê: ji nîsanê heta temûzê.

- Betlaneya nîvê serdemê (hefteyek) hefteya dawiyê ya gulanê yan jî hefteya pêşî ya hezîranê.
- Betlaneya havînê (şeş hefte) temûzê û tebaxê.

Roja dibistanê

- Ders 9ê sibê dest pê dikin, lê divê şagirt zûtir bên ku wextê wan hebe xwe amade bikin.
- Nîvro navberek heye (dema firavînê) zarok di vê navberê de li dibistanê firavîna xwe dixwin.
- Dibistan saet 3yê piştî nîvro ji bo zarokên pêşdibistanê û 3:15 ji bo hemûyên din diqede.

Spartek:

EYFS - Salên Pêşî/Asta Bingehîn (Kreş û pêşdibistan):

- Tê payîn ku welî bi rêk û pêk ji zarokên xwe re bixwînin (ji wan re bixwînin, gava ew hînî xwendinê bûn li xwendina wan guhdarî bikin).
- Dibe ku mamoste têkildarî mijarên hîn dibin spartekên heftane yê bikêf û nefermî bidin zarokan. Tişta herî giring xwendin e.
- Mijara spartekan li gorî dibistanan diguhere.

Asta kilîl 1 (KS1): Salên 1 û 2yan:

- Spartek bi piranî gelekî ne-fermî ne, tişta giring xwendin e,

- Dibe ku pêşbazî yan jî kaxiyên fêrker yên heftane bidin zarokan (Matematîk yan Înglîzî).
- Her wisa spartekên rastnivîsê KS1ê dest pê dikin. Dibe ku heftane 5-10 peyvan bidin zarokan.
- Hin dibistan aboneyên platformên perwerdehiya serxetî yên wekî Nessy, Purple, Mash, Time Table Rockstartsê ne.

Asta kifîl 2 (KS2): Salên 3-6an:

- Dibe ku her hefte kaxizên fêrker yên Matematîkê/Înglîzî bidin zarokan.
- Rastnivîsa ji bo testên heftane.
- Dibe ku her serdemê projeyê xebatê ya têkildarî mijareke ji aliyê mamoste ve hatî hilbijartin hebe.
- Û pê re jî heke bixwazin fêrkariya serxetî.

Klub:

- Gelek dibistan di navbera firavîne de yan jî piştî dibistanê çalakiyên ne têkildarî dersan pêşkêş dikin. Ev çalakî niha ji ber Covid-19ê hatine kêmkirin.
- Wekî mînak: futbol, tenîs, basketbol, netbol û wd. dikarin di nav klubên piştî dibistanê de bin. Yan jî çalakiyên nesporî yên wekî klubên koroyê, hunerê, dansê û wd.
- Hin dibistan klubên piştî dibistanê û klubên taştê pêşkêş dikin ku belaş e ji bo zarokên weliyên wan dixebitin yan jî yên pêdivî bi venêrîna piştî dibistanê re heye.

Civînen Weliyan/Mamosteyan:

- Di rewşa asayî de, her serdem ji bo axaftineke fermî ya derbarê rewşa zarokê we de şensê we yê rûbirû naskirina mamosteyê zarokên we heye (êvara weliyan).
- Dibe ku ev hevdîtin ji ber astengiyên Covid-19ê serxet bînin kirin.
- Heke derbarê zarokê we de xemên we hebin û hûn bixwazin bi mamosteyê wî re biaxivin, dibe ku pêkan be hûn li qada listikê pê re biaxivin yan jî ji bo randevuyekê telefon bikin yan jî emaîlekê bişînin.

Rojên Dibistanê yên Bê-unîform

- Bi piranî, serdemê carekê, dibistan dikarin bi armanca berhevkirina pereyan ji bo karên xêrxwaziyê rojê bê-uniform diyar bikin. Zarok dikarin bi cilên xwe yên malê werin.
- Bi piranî £1 jî tê bexşandin.
- Welî dê bi nameyekê yan jî emaîlekê derbarê roja bê-uniform de bên agahdarkirin.

Perwerdehiya Bedenî (PE):

- Wateya vê li dibistanê fêkirina egzersiz û bi taybetî listikên fîzîkî ye.
- Cilên zarokan yên ji bo dersa PE cuda ne.

Firavîna Dibistanê:

- Zarok dikarin bixwe biryarê bidin ka xwarina germ ya dibistanê bixwin yan jî xwarina xwe ji malê bînin.
- Firavîna dibistanê heta dawiya sala 2yan ji bo hemû zarokan belaş e, lê dibe ku hin zarok bi planeke taybet ya hikûmetê salên din jî firavîna belaş wergirin.
- Divê zarok şûşeyên xwe yên avê bi xwe re bînin.